**Daxuyanî li ser sekinandina hin saziyên nacîhanî çalakiyên xwe**

**li Bakur û Rojhilatê Suriyê**

Krîza Sûriyê ku bi sed hezaran qurbanî û paneber li peyî xwe hîşt, derbasî sala xwe ya çardehemîn dibe, û li gorî Neteweyên Yekbûyî, zêdetirî 16.7 milyon kes pêwîstiya wan bi alîkariyên mirovî hene, her weha li gorî Rapora Xaça Sor a Navdewletî, %90 ji xelkê Sûriyê Ew li jêr rêjeya hejariyê dijîn.

Ev hemû hijmarên xemgîn divê bibin çavkanî û bingeh ji bo zêdekirina piştevaniya hewildanên ku ji bo bidawîkirina êş û azarên gelê Sûriyê û bihêzkirina aramiyê li Sûriyê û herêmê, lê berevajî wê, şert û mercên ku gelê Sûriyê di dema dawî de dijîn bûne sedem ku kirîza mirovî girantir bibe, û li gor Netewên Yekbûyî ku di Cotmeha sala 2023an de hejmara penaberên Sûriyê li Ewropayê gihîştiye asta herî bilind di heft salên borî de.

Li bakurê rojhilatê Sûriyê, bi sed hezaran paneperên sûrî û biyanî (malbatên çekdarên berê yên DAIŞê) li kampên fermî û nefermî yên di bin serweriya Rêveberiya Xweser de dijîn, ku di van demên dawî de rastî êrîşên tund ên Tirkiyê ku stasyonên elektrîkê û avê û binesaziyên bingehîn hatin armanckirin, ew jî bû sedema ku bêtirî yek milyon kes ji av, elektrîk, û xizmetên bingehîn bêpar kirin, ku ev yek binpêkirina yasaya mirovî ya navneteweyî ye. Di êrîşên hewayî û balefirên bê mirovî yên dewleta Tirk de ku li ser herêmê pêk anî, sivîl hatin qetilkirin. Li gorî rapora Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ya 11’ê Adara 2024’an, ev êrîş dibin sûcên şer.

Ev buyer û bûyerên din, barê Rêveberiya Xweser û rêxistinên ku ji bo xizmetkirina bi deh hezaran koçber û penaberên li herêmê dixebitin, zêde dike. Mînaka herî ber çavan kampa Holê ye, ku heta niha tevî bi hezaran paneperên Sûrî û penaberên Îraqî, ku gelek ji wan malbatên biyanî yên DAIŞê ne, di hundirê xwe de dihewîn e. Herwiha, Hêzên Sûriya Demokratîk bi hezaran çekdarên berê yên mezin di navendên binçavkirinê li herêmên Rêveberiya Xweser girtî ye. Û Ev kesayet, cih û kampên hene, minakek zelal jî Kampa holê dibin ku hêz û mesrefek mezin ji bo Ewlekariyê wan were peyda kirin.

Di bin van şert û mercan de jî, mixabin, hin aliyên piştevanî mêl dikin ku piştgirîya xwe ji van kamp û navendan re kêm bikin an qut bikin bêyî ku encamên ku derkeve hole ber çavan derbas bikin. Hin bexşkar diyar dikin ku berdewamiya piştevaniya kampan dibe sedema mayîna penaberan li kampê û wan teşwîq dike ku venegerin warên xwe yên resen, ev yek rast e, lê tenê eger şert û mercên guncav ji bo vegera wan hebin. Piraniya nişteciyên kampê li bakur û rojhilatê Sûriyê yan malbatên biyanî ne ku heta niha welatên wan ew qebûl nekiriye, Sûrì ên ku ji herêmên di bin kontrola rejîmê reviyane, hinek ji wan dibe ku rastî cezayên darvekirinê bên, Îraqiyên ku şert û mercên ewlehî yên guncav li îraqê nînin, û gelê ku ji

herêma Serê Kaniyê (Ras El Eyn) û Til Ebyadê, ku piştî Tirkiye û komên girêdayî wê, bajar û gundên wan dagir kirin, koçber bûn.

Kêmkirin an qutkirina fonên rêxistinên herêmî û ajansên Neteweyên Yekbûyî yên ku ji bo mirovên jicîhûwarkirî dixebitin bê guman dê bibin sedema encamên xirab. Mînakek ji vê yekê: Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanî ji meha Nîsanê ve wergirtina haletên pizîşkî (baldariya tenduristiyê yên duyemîn) ji kampên Hesekê, El-Hewl, Arîşe, Roj, Waşokanî û yên din, ji bo nexweşxaneya ku ji aliyê wê ve tê piştgirî kirin di dîroka 1 nîsanê 2024 ji ber nebûna fonê, rawestand.

Berçavkirina vê biryarê û yên din berî lidarxistina heştemîn Konferansa Donatoran a Brukselê, pêwîstiyeke lezgîn e ji bo alîkariya penaber û koçberan û piştgiriya hewildanên ewlehî û aramiyê, û ev erkek mirovî ye ji bo her kesî ye.

Heyva Sor a Kurd

7/4/2024

**Kurdish Red Crescent, KRC – Heyva Sor A Kurd NGO**
**Headquarters:** Kornish district – Eben Hesham street, building num. 12 Al-Qamishli – Syria
Tell: +963 52 430 700 - email: info@hskurd.org - website: www.hskurd.org